

Li derdor û perawêza kongira niştimanî ya gelê Kurd li Sûriyê

Dr.Ebdilmecît Şêxo

Eger mirov rexnan nepejrîne , dê şaşiyên xwe pirtir bibin ,paşê ew nikane xwe ji wan şaşiyên rizgar bike rexne karekî hişmendî ye û pêdariya rasteqînî ji hiş re , ew e ; ku ew hiş nêrînên cuda bibhîse ,wan nêrînan bixwîne û sûdan ji wan bibîne.

Zênefo

Wek em dizanin ku tevgera azadîxwaza Kurd li Rojavayê Kurdistanê bi awakî fermî di 14 .06.1957 an de destpêkirî ye,lê mixabin di sala 1965 an de dabeşbûna yekê di partî dêmokrata Kurd de çê bû û ew bi van navan (Rast û Çep) di nav gelê me de hatin naskirin .

Li dawiya dawiyê hejmara partiyên me pirtir û pirtir bûn , ango niha ewanan ji 14, 15 partiyên pirtir in . Bê guman perçebûna tevgera me ya dadmend dilsariyek û reşbîniyek di nav gelê me de çê kir, gelek rexne ji aliyê miletê me de arastî rêber û pêşengên partiyên bûn,lewre hin partiyên yekbûn di nav xwe de ava kirin û di pişt re jî hin çarçewên Kurdî ji hin partiyên tevgera me ava bûn(Hevbendî , Enî, Hevrêz, Encûmena siyasî) . Lê divê em bêjin jî; gelek partiyên tevgera me ji zû de daxwaza bestandina kongira niştimanî ya gelê Kurd dikirin,bê guman ew daxwaza; hêviya gelê Kurd jî bû.

Piştî destpêka şoreşa aştiyane li Sûriyê, partiyên tevgera me gavên xwe berve girêdana kongira niştimanî lezandin . Di 26-27.10.2011ê de kongira niştimanî bi beşdarbûna 150 kesayetiyên serbixwe ,yên ku ji hemû qatên civaka kurdî haitibûn hilibjartin û ji sed nûnerên partiyên û di bin sîbera van parolên jêrîn de li Qamoşlê li darket. 1- Ji bo pêkanîna armanca raperîna aştiyane,(azadî û rûmetî) ji gelê Sûriyê re .2- ji bo dewleteke dêmokrat ,perlemanî , geljimar ku di wir de mafê netewî yê gelê

Kurd were dupatkirin û parastin .3- Bila di destura dewletê de gelê Kurd mîna pêkhatiyêke netewî û serke were pejrandin û nasîn . 4-Bila cudabûna netewî , olî , ta-îffî tune be!, Bila dewleteke welatparêz ,zanistiyane û dêmokart ji hemû hemweltiyên Sûriyê re hebe ! 5-Bila zor ,lêxistin û zivrûzengî tune be ! Azadî ji hemû girtiyên siyasî re li Sûriyê Kongire ji aliyên hin rîberên partiyên û çend kesayetiyên serbixwe bi bêhneke sincî ,siyasî berferh bi rê ve hate birin û serpereşkirin .

Piştî ku ji aliyê komîta birêvebir de sê pirojeyên belgeyên rêzanî ji beşdaran re hatin xwendin, endamên kongirê di heyameke siyasî û dêmokrat de nêrîn û baweriyên xwe bê perwa li ser hin xalên siyasî derbirin , serok û berpirsiyarên partiyên bi sîngên berferh têbînî û rexneyên beşdaran guhdar dikirin , piştî gufteguyên şarastanî û rexneyên bajarvanî , ewan kanîbûn guhertin di hin xal û biryarên siyasî de yê pêşkeşkirî de çêkirana.

Ji giringtirîn biryarên siyasî di kongira me de bi van wateyan bûn: 1- Di warê niştimanî de weha hate çespendin ; ev buhrandina (kirîza) welatperwerî û hewşvedayî ku li Sûriyê çê dibe;destlata Sûriyê ji ber wê de berpirsiyar e . ji sala 1963 an de partiya Bes zorê li miletê Sûriyê dike , ewa li dijî baweriyên azad e,ta niha ewê nikanî bû serastkirinên dêmokrat li welêt bi pêkbihaniya ,ewa rêzdariyê li mafên mirovan nagre . Di encama vê zordestiyê de, di 15 .03 2011 ê de pirîska şoreşê li piraniya parêzgeh û bajarên welêt vêket , ev şoreşa daxwaza azadiyê û parastina rûmeta gelê Sûriyê dike . Herweha jî ,kongirê dupat kir; kutakirina vê kirêzê, tenê bi guhertina destlata zordar bi hemû bingeşên xwe ve ; rêxistinî ,siyasî , ramanî û ji ji hevşelandina dewlata asayêşî çê dibe û

D..R.(8)